

Destveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 135
21'ê Gulan 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Pîrozbahî
Di 5'mîn salvegera avabûna Televîzyona Netewî a
Tîşk TV de, em pîrozbahiyên germ ên xwe pêşkêşî
tev xebatkarên neweste Tîşk TV û hemû xelkê
azadîxwaze kurdistanê dikin û hêviya serkevîtin û
berdewamiyê ji Tîşk TV û karmendên wê re
dixwazin.

Desteya weşana Agirî

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê diweşîne

Duheftînameya siyasi, civakî, çandî û hunerî

Kurdistan Çepera Berxudan Dij Bi Komara Mirovkuj

Gireva Giştî Li Kurdistanê



Şikesta Dîplomasiya Îranê:

Şewra Ewlekar Embargoyên
Xurttir li dijî Îranê Nîqaş Dike

R: 2

Elqaîde:

Emê Kûpa Cîhanî bikin
Gola Xwînê

R: 2



Rûpel 2

Gaziya
Partiya
Demokrat
A
Kurdistanê
Îranê



Rûpel 3

Peyama
Birêz
Mistefa
Hicrî,
Sekreterê
Giştî Yê...



Rûpel 4

Bangewaz
a Hevbeş A
9 Partî û
Rêxistinên
Siyasî



Rûpel 6

Hevpeyvîn
Bi Birêz
Mesûd Tek,
Sekreterê
Giştî Yê
PSK'ê



Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî

Rûpel 11

Felsefeya
Şahî û
Dawetên
Kurdî li
Bakurê...



Mecîd Cinîkanlo

Bangewaza Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

Hewelatîyên xebatkar!
Xelkê azadîxwaz ên
Kurdistanê!

Rejîma dijî gelî a Komara Îslamî a Îranê li kuştina azadîxwazan de berdeyam e û dawîn goriyên vê kuştare jî heya niha 5 ciwanên azadîxwaz bûne ku di sibêdehiya roja Yekşemî. 19'ê Banemerê, di girtîgeha Êvîn a Tehranê de hatin darvekirin.

Ferzad Kemanger, Şîrîn Elemholî, Ferhad Wekîlî û Elî Heyderiyân ew 4 lawên Kurd bûn ku tawana wan tenê Kurdbûn û pêdagirî li ser daxwaza mafên rewa ên gelê mafxwarî yê wan bû. Ew, 4 kes ji hezaran têkoşerên nîştimana me bûn ku dilê wan teji bû ji evîna rizgariya gelê wan ji destê rejîma cehl û nezaniyê û niha jî hejmarek din ji hevlatîyên azadîxwaz ên me di girtîgehên rejîmê û di bin îşkenceya kirêgirtîyên wan de ne û li bendê ne ku kengê dilê pir ji hêvî yên wan dê bi gulleyên azadîkujan ji lêdanê bisekine.

Bê guman heya ku xelik tenê bi kul û keser ve şahidê kuştina keç û xortên biwêr û bicerg ên xwe bin û di piratîk de dijberiya xwe derheq bi van hemû zulm û

zordariyê nîşan nedin, di pêşerojê de jî emê rojane şahidê wan bûyerên tal bibin, çunku guneha rejîmê bi tu mafxwazek Îranî û bi taybetî mafxwazên Kurd de nayê.

Lewma em daxwaz dikin ku roja Pêncşemî, 23'ê Banemera 1389 (13'ê Gulana 2010'ê Zayînî), bo nîşandana nerazîbûnê û dijberî li hember îdama wan ciwanên azadîxwaz û sekinandina îdama azadîxwazên din ên Kurd, bi hevve û yekgirtî dest bidin mangirtinek giştî û di wê rojê de dibistanî, xwendekar û mamosta neçin qutabxaneyan, karmend neçin ser karê xwe, bazarî dukan û bazaran dabixin, kedkar li ser kar amade nebin û hewce ye di wê rojê de xelik ji mal dernekevin û şeqam û kolanên bajar û bajarokan vala bihêlin. Bi wî awayî jî bi rejîmê û malbatên wan şehîdên me ên dawîn rabigehînin ku şehîd û keç û xortên cesûr, biwêr û azadîxwaz ên di girtîgehan de, keç û xortên xwestivî ên hemû neteweya Kurd in û ji aliyek din ve jî, bi vê bêdengiyê nifret, kerb û kîn û bêzariya xwe li dijî Komara Îslamî nîşan bidin.

Bi hîviya wê yekê ku hevênîştimanên xebatkar bi wê mangirtinê ku xebatek



sivîl û serdemiyane ye, roja Pêncşemiyê bikin rojek dîrokî û pir ji şanaziya xwe ji rojên berxwedana dijî zulm û serberedayî a rejîma Komara Îslamî, û bi wî awayî jî dengê nerazîbûna xwe bigihîjînin guhê desthilatdarên rejîmê, gelên bindest ên Îran û hemû cîhanê.

Serkewe xebata azadîxwaziya hemû xelkê Îranê

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

Deftera Siyasî
21'ê Gulana 1389'ê Rojî, 11. 05. 2010 a Zayînî

Şikesta Dîplomasiya Îranê:

Şêwra Ewlekar Embargoyên Xurttir li dijî Îranê Nîqaş Dike

Rojek piştî nîşandana keyfxweşiya rêberên Komara Îslamî derheq wajo kirina rêketinê bi Turkiyê û Birazîlê li dor guhertina Uraniyomê, ku armanca eslî ya wê pêşgirtin ji hewlên navnetewî bo xurtkirina tehrîman dijî bernamaya etomî ya Îranê bû, Welatên Yekbûyî yên Amerîkayê,



pêşnivîsa biryarnamêyê jî bo bas û pejirandinê radestî Şêwra Ewlekar kir ku Rûsiya û Çînê jî ew yek pesend kirine, ku hin cezayên nû li xwe de cih dide û tê çavnihêrkirin ku xesarek mezin bide sistema bankî û abûrî û warê seneta Îranê, bi taybet aborî a Sipaha Pasdaran.

Ji hêla din ve jî Serokwezîrê Turkiyê, Îran hişyar kir ku eger li gor çarçoveya rêketinnameyê kar neke, Turkiyê dê rû ji Îranê vezivirîne û Îran jî dê bi tenê bimîne. Yek ji xalên ku di wê biryarnamêyê de îşare pê hatiye kirin, mafê lêgerina keştî û gemiyên Îranê di avên navnetewî de ye bi merema pêşgirtin ji barkirina alavên peywendîdar bi bernamaya navikî ya Îranê.

Hêjayî gotinê ye, ger ku tehrîman tu encam nebe û hikûmeta Îranê jî her wisa xebatên xwe bo bidestxistina çeka etomî bidomîne, bi egerek zaf ve nawendên etomî yên Îranê dê bîn bombe bardûman kirin

Elqaîde:

Emê Kûpa Cîhanî bikin Gola xwînê

Rêxistina terorîsî ya Elqaîde, gef xwarin ku Cama Cîhanî a 2010' an li Afrîqaya Başûr de dê bibe cihê xwîn û agir. Ewa cara yekim nine ku terorîzm, mezintirî bûyera werziş a cîhanê bi gefa jinavbirinê berbirû dike, lê wekî diyar ve carê mesele ji sînorê gefxwarinan boriye.



Rêberên Elqaîdeyê, çendî car di kasêten vîdyoyî de ragihandine ku Amerika û Ewropa tu nasyarî li Afrîqayê ninin û di dema Kûpa Cîhanî de jî ew dê pitir xatircem bin ku Panaxa reşan, cihê manovrên Nato yan jî hêzên kirêgirtî yên hin welatên îstîmarlêdayî ên Afrîqayê nine.

Nûçeya derheq teqandina bi tirs û xeternak ku her yek ji wan şiyana ragirtina û pûçkirina bi tewayî ya cama Cîhanî hene, eva cara çendê ye ku ji aliyê rêberên Elqaîdeyê li Îraq, Efxanistan, Pakistan û Erebestana Seûdî de erê û tekez li ser tê kirin. ragihandine û tekez li ser kirine. Di yek ji wan peyaman de hatiye ger ku cama Cîhanî nebe qada agir û xwînê, Elqaîdeyê tunebûyî bizanin. Ewe jî di halekê de ye ku ertêşa Niçîrye, ertêşa Afrîqaya başûr, Polîsê Navnetewî, hêzên Natoyê û serbazên pêşeng û mîaşxor ên Afrîqayê, çendî caran ewlehiya tewaw a Afrîqaya başûr garantî kirine Hêjayî gotinê ye ku Kûpa Cîhanî a 2010'an dê ji 21'ê Cozerdanê vir de bi beşdariya 32 tîman destpê bike.

Gireva Giştî Li Kurdistana

Roja Pêncşemî, 13'ê Gulana 2010an, xelkê Kurdistana di gireveke giştî de, lidarvekirina 4 girtiyên siyasî ên kurd û girtiyekî xelkê Şîrazê şermezar kirin. 5 girtiyên siyasî, sibêdeya roja Yekşem, 9'ê Gulana 2010'an, li girtîgeha Êvînê hatin îdamkirin. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û pîrraniya partî û saziyên Kurdistana ên Opozîsyona Komara Îslamî a Îranê, bi derkirina daxuyaniyên hevpar û cuda cuda, daxwaz ji xelkê kiribûn ku bi gireveke giştî ew kiriyara çovane a rejîmê şermezar bikin û li hember xetera lidarvekirina girtiyên din ên siyasî de bêdeng nebin. Herwiha çendî xwenîşandan li welatên Ewropa, Amerika û welatên derdorê li dijî îdamkirina 5 girtiyên siyasî ji aliyê rêxistinê siyasî û sivîl ên Kurdistana Îranî yên li derveyî welat, bi awayekî berfireh hatin lidarxistin. Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ, bi hinceta birêveçûna gireva giştî a xelkê Kurdistana, peyamek da xelkê Kurdistana û malbatên serbilind ên şehîdan ku deqa wê peyamê di rûpela 3'ê de hatiye belavkirin.

Peyama Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê Bi Boneya Gireva Giştî A Xelkê Kurdistanê

Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê!
Malbatên serbilind ên şehîdan!
Silav û rêzên bêdawî
Carek din bi tekoşîn û yekrêziya

we, rojên din ên geş di dîroka xebata rewa û serdemiyane ya gelê me, dijî zulm û zordariya rejîma Komara Îslamî, hat tomar kirin.

Piştî îdamkirina 5 xebatkarên siyasî ji aliyê rejîma Komara Îslamî li roja Yekşemî, 19'ê Banemerê di girtîgeha Ewînê de, bi navên Ferzad Kemanger, Ferhad Wekîlî, Şîrîn Elemholî û Elî Heyderiyân û Mehdi Îslamiyan ku 4 kesên yekem Kurd û kesê din jî ne Kurd bû, bizavên nerazîbûna xelkê bi armanca nişandana hevhemî ligel malbatên şehîdan û gelê Kurd û nişandana bêzariya xwe ji rejîmê, li Kurdistanê Îraqê, Ewropa û Amerîkayê destpêkir û di roja Pêncşemî, 23'ê Banemerê bi birêvebirina girevek giştî li piraniya bajar û bajarokên Kurdistanê de gihîştê kopika xwe. Ev mangirtina seranserî, bersivê hêja bû bo kiryarên dijîgelî ên rejîmê derheq rijandina xwîna ciwanên welatparêz û dilsoj ên gelê mafxwarî yê me.

We bi vî karê demokratîk, ew peyama rohn gihande malbatên serbilind ên şehîdan, girtiyên siyasî û yek bi yeke xebatkarên rîya azadiya gelê me, ku gelê Kurd ji Xoy û Selmasê ve, heya digîje Kirmaşan û Îlamê, neteweyek yekgirtî ye. Keç û xortên xebatkar li her kuderê bin, yê malbatekê ne û xema jidestdana her yek ji wan, xema hemû gelê me ye, lewre ye jî ku hemû bihevê mil didin ber barê xem û kovana şehîdbûna xweştiviyên xwe û wê xemê dikin hêvênê sorbûn û pêdagiriya pêtir li ser xwast û daxwazên

rewa ên xwe.

Xincî wê yekê, ev mangirtina seranserî, baştirîn peyama bû bo desthilatdarên Komara Îslamî ku carek din jî wê rastiye têbigîjin ku bi şehîdkirina Keç û xortên me, bi leşkerkişî û çavsoyîyan ve ji gelê Kurd û hemû gefxwarin û pîlanên wan, gelek ji wê yekê lawaztir û bêşiyantir in ku gelê Kurd bi çokde bînin û di bin zext û givaşan de stûxwarê siyasetên paremayî û şikestxwarî yên xwe bikin.

Bila xelkê cîhanê jî bizanin ku rejîma Komara Îslamî serbarê hemû mehtkirin û pesindayîna xwe, lê li hember îradeya mafxwazaneya gelê Kurd û netewên din ên Îranê de, zelî û bêşiyân û lawaz e.

Xelkê Hîşyar û Çavnetirs ên Kurdistanê!

Piştewaniya tex û qatên Îranî û Kurdistanî di nişandana hevhemî li gel malbatên şehîdên ezîz ên me û hevavî û gavavêtina wan dijî rejîma Komara Îslamî li gel gelê Kurd, yekreffî û hevpeywendiyek wiha di navbera alîgirên azadî û parêzerên mafê mirovan ji aliyekê û li dijî desthilatdarên rejîma Komara Îslamî jî ji aliyê dinê ve, ne tenê li Kurdistanê, belkî li hemû deverên Cîhanê pêkanî ku bi dirêjîya temenê pir ji şermezariyê yê Komara Îslamî de bêwêne bû. Ewe jî li cihê xwe de serkevtinek mezin bû. Bêguman ew serkevtina mezin jî bi bê piştewanî, hevavî û hevdengîya berîn nedihat bidestxistin. Lewra îzin dixwazim ji aliyê xwe û rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve, spasiya bêdawî û pîrozbahîya xwe arastey hemû gelê qehreman yê Kurd li Kurdistanê Îranê, derve, xebatkarên Partiyê bi taybet di navxweyî welat, sazîyên siyasî ên



Kurdistanê Îran, Turkiyê û Sûriyê û kesayetiyan Wêjeyî û siyasî ên Kurdistanê Îraqê bikim ku di vê mangirtinê de alîkarê xwîşk û birayên xwe li Kurdistanê Îranê bûn. Diyare asta dijîkirîya xelkê nerazî ji rejîmê tenê Kurdistan negirt, belkî hêzên siyasî ên opozîsyona Îranê jî serbarê bir û boçûnê cuda, bi awayek yekgirtî li welatên Ewropa û Amerîkayê, di xwenişandan û kor û civînên ku bi vê boneyê ve pêk hatibûn, beşdariyek bêwêne kirin ku hêjayî rêzgirtin û pêzanîne ye.

Em hîvdarî hemû ev dijîkirîyan ku piraniya mafxwazên Îranî di heyamê wan çend rojane de nişan dan, bibe destpêkek pîroz bo xurtkirina pêtîre xebata yekgirtî a xelkê bizal hatî yê Îranê heya hîloşîna yekcarî a rejîma hov û serberedayî a Komara Îslamî û avakirina hikûmetek li ser xwast û îradeya hemû gelên Îranê.

Serkevtin bo xebata rizgarîxwazane ji destê dîktatorî û paremayiyê

Yekgirtîtir be hêza bêdawî a civatên xelkê azadîxwaz ên Îranê

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Sekreterê Giştî

Mistefa Hicrî

23.02.1389 (13.05.2010)

Daxuyaniya Hevbeş Bi Boneya Darvekirina Pênc Kes Ji Têkoşerên Siyasî Ji Aliyê Rejîma Komara Îslamî Ve

Gelên azadîxwaz ên Îranê!
Xelkê zulmlêkirî yê Kurdistanê!
Xebatkarên rîya azadiyê!
Carek din Komara Îslamî,

merama piş, mirar û dujminkarane yê xwe li hember gelê mafxarî û mafaz yê Kurd nişan da.

Desthilatdarên Îranê li tîrsa ji destdana desthilata reşa xwe, bi berdeyamî dest didine kiryarên hovane û tu sînor û berbestek li hember cinayetkarî, mirovkujî, azar û îşkencekirina hevvelatîyên Îranî û Kurdistanî de ninin.

Komara Îslamî di doma cinayet û kiryarên nemirovane yên xwe de, roja 9'ê Gulana 2010'an, li zarê dozgerê giştî yê bajarê Tehranê ragihand, pênc kes ji girtiyên siyasî bi navên Ferzad Kemanger, Elî Heyderiyân, Ferhad Wekîlî, Şîrîn Elem Holî û Mihdi Îslamiyan lidarvekirine.

Em vê cinayeta qirêje rejîmê û

darvekirina têkoşerên rîya azadiyê bi tundî şermezariyê dikin û behî û serxweşîya xwe ji kes û karên wan dikin. Her bi vê hêcetê, daxwaz ji navend û rêxistinên parêzerên mafên mirovan li cîhanê û hemû hêz û aliyan siyasî yên şoreşvan û welatparêz dikin li hember vê cinayeta hov de bêdeng nebin û helwesta tunda xwe di vî warî de nişan bidin û vê tawanê şermezariyê bikin.

Her çend desthilatdarên milhur û dîktator yê Wîlayeta Feqîh bi vê cinayetê karînin pênc têkoşerên welatparêz şehîd bikin, lê bêguman gelê Kurd bi vê cinayetê biçok de nahêt û xebat û tekoşîn, heta destve anîna armancên wan şehîdan ku hîloşîna rejîma Komara Îslamî û gehîştin bi maf û serbestiyên hemû gelên Îranê ye, dê dom bike.

Desthilatdarên rejîmê bi vê cinayeta nû. carek din ewe bi xelkê Kurdistanê nişan dan ku tu demekê baweriyê bi wan nakin,



çûnkî wan li her fersendekê bo darvekirina ciwanên Kurd mifah wergirtiye.

Komara Îslamî bi vê cinayetê carek din selmand ku cuda di hîloşîn û Jinavçûna wê, rêyekî din bo bidestana mafên hemû xelkê Îranê û xelkê Kurdistanê û azadîxwazan li pêseve nine.

Mirin û neman bo rejîma dîktator a Wîlayeta Feqîh

Silav li canê şehîdên rîya azadiya gelê Kurd û gelên Îranê.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Komeleya Şoreşvanên Zehmetkêş ên Kurdistanê

Sazmana Xebata Kurdistanê Îranê

9'ê Gulana 2010 ê Zayînî

19'ê Banemera 1389 a Rojî

Bangewaza Hevbeş A 9 Partî û Rêxistinên Siyasî

Komara Îslamî di roja 9'ê Gulana 2010'an de, Pênc girtiyên Siyasî bi navên Ferzad

Kemanger, Şîrîn Elemholî, Elî Heyderiyân, Ferhad Wekîlî û Mihdî Îslamiyan di girtîgeha Êvîna bajarê Tehranê de li darvekirin. Darvekirina wan pênc girtiyên siyasî dijî pîvanên mirovî û yasayên navnetewî û heta yasayên Komara Îslamî ye jî.

Darvekirina wan pênc girtiyên siyasî di bereberê salvegera 12'ê Gulanê de, nîşana tirsê karbidestên rejîmê li serhildana nerazîbûna xelkê ye. Ew bi ajotina otombîla darvekirinê, dixwazin rewşek pir ji tirs û xof bi ser welat de zal bikin. Pêş bi hatina xelkê bo ser şeqaman û nerazîbûnên giştî dijî Komara Îslamî bigrin û nehêlin xelk dijî dîktatoriyê dirûşman bidin. Bê haydar ji wê ku otombîla tepeserkinê û darvekirinê bêhêzî û neşiyana xwe di sê dehsalên borî de, di bêdengkirina bizava nerazîbûnê de nîşan daye. Eger tepeserkin û darvekirinê karîba dengê nerazî yê xelkê dijî dîktatoriyê qutbike, îro tepeserkaran wiha ji heriketa nerazîbûna xelkê di roja 12'ê Gulanê

de neditirsyan.

Dehan kesên din ji hevvelatîyên me li Kurdistan, Tehran û cihên din ên Îranê di bêdadgehên rejîmê de biryara darvekirinê bi ser wan de hatiye sepandin û metirsiya mirinê gefan ji canê wan dixwe. Dibe otombîla tepeserkin û darvekirina Komara Îslamî bihêzî sekinandin û îzn bi rêveberên rejîmê nehê dan ku kurên welatê we îdam bikin.

Em, part û rêxistinên siyasî, daxwzê ji hemû hêzên azadîxwaz dikin ku roja 15'ê Gulanê, di civînan û xwenîşandanên bajarên cuda cuda de beşdarî bikin û dengê nerazîbûna xwe, dijî dîktatoriyê bi guhê cîhaniyan bigihîjînin û hevxiyariya xwe tevî malbatên darvekerîyan nîşan bidin.

Roja 15'ê Gulanê, li her cihê bin, bila lihev kom bin û yekparçe û yekdem kiryarî nemirovaneya rejîmê şermezar bikin û dengê xwe bilind bikin bo hilweşandina biryara darvekirinê û serbestiya hemû girtiyên siyasî.

- **Yekîtiya Komarîxwazên Îranê**



- **Partiya Demokrata Kurdistanê**

- **Partiya Demokrata xelkê Îranê**

- **Partiya Komeleya Kurdistanê**

- **Bereya Netewî Îran – Ewropa**

- **Rêxistina Yekîtiya Fidayiyên xelkê Îranê**

- **Rêxistina Yekîtiya Fidayiyên xelkê (piranî)**

- **Şewra dem, Sosyafîst Çepên Îranê**

- **Şewra Hevahengiya Bizava Komarîxwaz demokrat û laîkên Îranê**

13'ê Gulana 2010'a Zayînî

23'ê Banemera 1389'ê Rojî

Daxuyaniya Kongireya Netewên Îrana Federal Li Sêdaredana Xebarkarên Sivîl Ên Netewa Kurd Ji Aliyê Komara Nezanî û Xurafat Ya Îranê Ve

Ferzad Kemanger, mamostayê mandînenas ê gundên Kurdistanê, mamostayê xemxuar ê zarokên Kurd, ev mamostayê fidakar yê perwerdekerê, Masiya reşa biçûk a rûbarê Eres a Azarbaycana serewe behrengî û rûbarê serbazî ê Belûçîstana Yeşîlê Mêhernehad ji aliyê şevperestên Komara Îslamî, tevî 4 mirovên azadîxwaz ên din, Elî Heyderiyân, Ferhad Wekîlî, Şîrîn Elemholî û Mehdî Îslamiyan sibêya roja 19'ê Banemera 1389 a Rojî, tevî karwanê şehîdên hertim zindî yê rêya azadiyê bûn.

Komara Îslamî di despêka hatina serkar û destbiserdegirtina desthilatê li Tehranê, bi hemû şiyana xwe potîn di pê de, mijûlî kuştin û birîn û jînosayda netewa Kurd û netewên din ên beraberîxwaz ên Îranê bûye. Niha rejîma Wîlayeta Feqîh ji tirsê qatên civaka bêzar û rûxana xwe ji aliyê xelkê ve bi dîr nabîne, roj bi roj dirindeyî û weşbûna xwe zêde dike ku bi xeyala xaw a xwe xelkê çavtirs bike. Lê ji wê yekê haydar nine ku ew xelkê bi taybetî netewa Kurd û xebatkarên Kurd aram nabin û heya

serkevîna dawîn ku bidestxistina serwerî û serbestiya netewên akincî ên Îranê ye tucar venagerin.

Hikûmetên bê piştewaniya xelkê bo mana şermaneya xwe

bo çend demên zêde, rêçareyek xincî pişgrêdan bi sernîze, îdam û îşkence ên sedsalên navîn nine.

Komara Îslamî ku demek zor e rewayeta yasayî ya xwe bi tewahî ji dest daye û bi bê piştewaniya xelkê di rêza qirêjtirîn û xirabtirîn welatên cîhanê de ye, bi bawera xwe bi îdam û tunekirina fîzîkî a xebatkarên û pêkanîna rewşa tirs û hovîtiyê bo nav xelkê Îranê de, wan ji berevanî û xebat bo demokrasiyê radiwestîne.

Lê ev xeyala xaw tûndûtîjî a dewletî ku necwantirîn ji wan di sedsalên bîst û yekan de destrêjîkirin bi girtiyên jin û



mêr û li sêdaredana jin û mêrên xebatkarê Îranê ne, xwesteka xelkê Îranê bo hîloşandina rejîmek wiha reş û sedsalên navînî xurdtir bike.

Kongireya Netewên Îrana Federal ku bi awayekî giştî dijî lisêdaredana mirovan e, ligel îdankirina îdama xebatkarên Kurd ku tawanek xincî pêdagirîkirin li ser mafên mirovan ên xwe nebûye, xwe di xema netewe û xebatkarên Kurd û malbatên wan şehîdan de hevpar dizane û piştrast e ku riya wan heya bidestxistina wan mafan dirêjî heye.

Kongireya Netewên Îrana Federal

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdulla Hicab



"Serkevtin", Şîrîn A Serbilind

Tenê ev gotin bi xwe dîrokek e, eger guhdarên gotinê jê fam bikin. "Serkevtin", gotina dawîn ya

nameya dawî a şêrejina Kurdistanê, Şîrîn a serfiraz bû. Ev gotin a tije wate, hejandin, tevger, vejîn, serhildan, serbilindî û berxwedan, pêşengiya tevgera îro ya Kurdistanê dike. Riya ku Şîrînê û şîrînên welat têde serî danîn, divê bigehe "serkevtinê". Ji ber ku ji serkevtinê bi der tu riyên din nînin û ji serkevtinê bi der çî bersiv ji berxwedana Şîrîn, Ferzad, Elî, Ferhad û Mehdiyê şehîdên azadî û demokrasiyê re nînin.

Xwedî derketina gelê Kurd ji şehîdên xwe yê dawî û ji nîrxên xwe yê netewî re, di wan çend rojên dawî de dubare gelê Kurd weke pêşengê tevgera azadîxwaz li Îranê anî meydanê. Dubare bajar û gund û deşt û dolên Kurdistanê rengê berxwedanê bi xwe ve girtin. Carek din hemû Kurdistan bû yek û ji Komara Îslamî, nîrx û îdealên wê û ji siyaset û kiryarên wê yê dijî mirovatîyê re gotin NA.

Rejîma Komara Îslamî bi îdamkirina bi komîa têkoşerên Kurd, îro dubare rûpelek nû ji dîroka cinayetên xwe zêde kir, lê li hember îrade û daxwaziyan gelê Kurd de zelîl û bêçare ma. Ji ber ku bi şehîdbûna wan têkoşeran re hemû Kurdistan bû Ferzad û Ferhad û Şîrîn û Elî. Kurdistan ku bi salan e bûye meydana berxwedan li hemberî dîktatorîyê, ji mêjve ye hambêza xwe ji bo wergirtina laşê bixwîn, lê serbilinde keç û xortên xwe re vekirîye. Lê şehîdên vê carê yê Kurdistanê ji aliyê hemû mirovatîya azadîxwaz ve hatin pêşwazî kirin.

Bi îdamkirina Şîrîn, Ferzad, Ferhad û Elî û Mehdi re, hemû wijdanek azadîxwaz di cîhanê de ji bikerên cinayetê û ji Komara Îslamî nefret kirin. Nav û berxwedana wan şehîdan di nava gelên Îranê û azadîxwazên welat de jî hevbendiyek nû ava kir. Navê Ferzad mamostayê azadîxwaz, navê Şîrîn jina serbilind, navê Ferhadê girêdayî bi nîrxên azadiyê re û navê Elî yê tîniyê serbestiyê bû sembola berxwedana netewa Kurd li hemberî zordariya rejîma dirindeyê Komara Îslamî û bû sembola rewabûna daxwaziyan netewa Kurd. Şehîdên dawîye Kurdistanê jî dubare rewa bûna xebata gelê Kurd û ciyê peşenge tevgera Kurdistanê di pevajoja azadiya gelên Îranê de ji hemû cîhanê re da selimandin.

Komara Îslamî ji roja yekê ya deselata xwe, bi kuştin, îdam û şer li hember neteweya Kurd de sekiniye. Îdam weke yek ji emrazên bêdeng kirina dengê azadîxwaziya têkoşerên Kurd ji aliyê rejîmê ve tê bikar anîn. Lewma Komara Îslamî ev 30 sal in ji bo

şikandina ruhê berxwedan li Kurdistanê, di hember têkoşerên Kurd de bi kar tîne. Lê îdama vê carê, bi xwe bû ben (kindir) û kete qirika bikujan de.

Berxwedana gelê Kurd li hemberî rejîma Îranê, di wan 30 salên dawî de ciyê tevgera Kurd di pevajoja azadî û demokratîze kirina Îranê de nîşan daye. Lewma Komara Îslamî her dema ku hest bike dengê azadîxwazî di beşên dinê welat de belav dibe, zexta xwe li ser gelê Kurd zêde dike. Ji ber ku karbidestên paşvero yê Îranê ji wê yekê emîn in ku Kurdistan heta dawî, wê li hember dîktatorîyê de pêşengiya tevgera azadîxwaze hemû gelên Îranê bike.

Bersiva gelê Kurd ji cinayeta nû ya rejîmê re dubare ev rastî nîşan da. Hevdengî û hevbendîya ku gelê Kurd bi bîranîna şehîdên xwe yê dawî re nîşan da, destpêka qonaxek nû di tevgera netewîye Kurdistanê de bû. Di wan rojên dawî de hemû Kurdistan bi Şîrîn, Ferzad, Elî, Ferhad û hevqederê wan Mehdi Îslamiyan re bû û nîşan da ku ev şehîd, nîrxên hevbeşe hemû Kurdistanê û şehîdên demokrasî û pêşengên tevgera dijî dîktatorîya olî ne ku îro Îran kiriye cehnima ser rûyê erdê.

Berxwedana şehîdan, xwedî derketina gelê Kurd û hevdengîya ku tevgera azadiyê ji xwe nîşan da, pêngavek din tevgera azadiyê ji armancên xwe nêzik kir û ciyê pêşengên şehîd di dîrokê de diyarî kir. Êdî "Şîrîn" bi berxwedana xwe, bi helwesta xwe û bi daxwaziya xwe ya dawî ku gotina "Serkevtin" bû, bû yek ji sitûnên here bihêz yê dîroka nû ya Kurdistanê. Ferzad û Ferhad û Elî jî bûne pêşengê tevgera azadiyê û heta heta di nava dilê gel de cî



girtin.

Berxwedana şehîdan û helwesta gelê Kurd mesajek eşkere da dîktatorên mirovkuj ku bi girtin, îşkence û kuştinê tenê rûyê xwe di dîrokê de reştir dikin. Ji ber ku xwîna şehîdan, pêşeroja gel geş dike.

Lê mesaja herî bi wate ya wan şehîdan û daxwaza herî mezin ya ku gelê me bi xwedî derketin ji şehîdên xwe re anî rojevê, ji bo partî û rêxistinên siyasî yê Kurdistanê bû. Têkoşerên riya azadiyê bi yekdengî, daxwaza xurtkirina berxwedan heya serkevtina dawî anîn ziman û gel bi yekdengî li hember dîktatorîyê de rabû. Ev yekîti, hawarek bû ji bo hevgirtina neteweyî.

Ava kirina platformek hevbeşe netewî, bi dawî anîna netifaqiyên navxweyî û hevbendiyek bilez ya siyasî take helweste ku dikare bersiva banga "Serkevtin" a Şîrînê, dengê azadîxwaziya Ferzad, Elî, Ferhad û Mehdiyê hevqederê wan û hevbendîya ku di wan rojên dawî li Kurdistanê ava bû bide.

Bila hêz û partiyên siyasî ên Kurdistanî, weke bersivêk pêwîst ji bo banga gel û weke nîşaneyê girêdana bi xwîna şehîdan re, ji niha ve bi hemû rengên xwe yê cuda ve tevli eniyek hevbeşe neteweyî bin û ji hemû netifaqî û cudatîyan re bêjîn NA. Bila weke nîşaneyê rêzgirtin ji şehîdan, di nav tevgera Kurd li Rojhilata Kurdistanê, hevbendiyek neteweyî çêbe.

Şehîdên me wê heta hetayê di dilê me de bijîn. Bila serê gelê we sax be. Bila serê malbatên şehîdan sax be.

Hevpeyvîn bi Birêz Mesûd Tek, Sekreterê Giştî yê PSK'ê

Piştî wê ku midehek bû paketa hikûmeta AKP'ê bo reformên Destûrî rojê siyâsî ya Turkiya û Parlemantoyê bi xwe ve mijûl kiribû, aqibet çend rojan berî niha hat pesend kirin û dê bikewe ber referandomê ku qirare çend mehên din birêve biçê. Herçend ku li paketê de tiştek bi navê kurd û pirsê kurd tunebû, lê ji bo pêşveçûna demokrasîyê, mafê mirov û kurtkirina destê leşkeran di siyasetê de û şidandina hewsarê wan pir girîng bû. Her ji ber wê jî bû ku opozîsyon û statokparêzan ewqas dijberî pêre dikirin. Mixabin take Partiya Beşdar li Parlemantoya Turkiyê de (BDP) jî, piştgiriya wê paketê nekir. Me dixwast raya BDP'ê jî li ser wê helwesta wan bistin, lê her car bi hêcetêkê paşde xistin û emê hewlê bidin ku paşan raya wan jî werbigrin. Bo baskirin li ser wê paketê, helwesta kurdan û bi giştî rojê siyâsî a Turkiyê, me çend pirsyar arasteyî birêz Mesûd Tek, Sekreterê Giştî yê PSK'ê, ku partiyek îleqal, xwedî dîrok û bihêz di qada siyâsî a Turkiyê de ye, kirin û raya Partiya wan stand ku deqa wê li jêr de dikewe ber çavên we xwendevanên hêja.

Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî

Yasaya Bingehîn a Turkiyê ku bi çavkaniya hemû bêbextî, şer, gorîdan û kavilkariyan li

Turkiyê de tê hesabandin, bi taybet înkara gelê kurd li wî welatî de dike û herweha bûye asteng li hemberî pêşketin û geşekirina demokrasîyê li wî welatî de, niha derfet çêbûye ku AKP, hin guhertinan tede pêk bîne. Hûn wek Partiya Sosyalîst vê pêşnûmayê û paketa AKP'ê çawa dinirxînin? Bi raya we ew gava AKP'ê şikandina tabo û zêhniyeta şeklgirtî li ser bingeha kemalîzmê û înkara gelê kurd nagehîne?

Belê, rast e. Ji damezrandina Komara Turkiyê heya îro, Destûr di wî welatî da her tim bûye yek ji çavkaniyên sîstema Kemalîst, ku li ser înkara kirina hemû reng û dengên Turkiyê yê olî û netewî hatiye ava kirinê. Hemû yasayên ku li pêşya azadî û demokrasîyê, li pêşya guhartin û pêşketinê astengên mezin in, ji Destûrê çavkanî digrin. Ji bona vê yekê jî, guhartina Destûrê û çêkirina destûreka nû û serdemî, ku divê pir rengî û pir dengiya civata Turkiyê nîşan bide, bûye armanca serekî ya hêzên pêşverû, demokrat û çep.

Li Turkiyê hêzên hanê her tim daxwaza guhartina Destûr, bi taybetî yasaya serdema 12'ê Îlona faşîst kirine, ji bona vê armançê kar û xebat her berdewan bûye û dê berdewan be. Xebat ji bona guhartina Destûrê carna sar bûye carna jî gelek germ. Bi taybetî di proseya Yekîtiya Ewropa (YE)ê da, pirsê destûr û guhartina destûrê hertim di rojevê da bû. YE ji bona endametiya Turkiyê di vê yekîtiyê da daxwaz kiriyê û dike, ku divê destûr bê guhertinê hinek xalên destûrê bi gor binemayên YE ji nû ve bêne nivîsîn û hwd.. û gelek rêxistin û sazîyên pişeyî û demokratîk û sendikayan, projeyê destûreka nû amade û pêşkêşî bir û rayê kirine û gelek gengeşî li ser projeyên hanê hatine kirinê.

Bi kurtî proseya guhartina Destûrê bi AKP û paketa wê va dest pênekiriyê. Lê belê

projeya AKP proseya guhartina destûrê germ û gurtir kiriyê, Ji ber ku eva cara yekê ye, hikûmetek derbareyê guhartina destûrê, projeyeka berfireh pêşkêşî Meclîsa Turkiyê bike û projeya hanê jî ketiyê ber behs û lêkolînê.

Daxwaza me wek Partiya Sosyalîst a Kurdistan destûreka nû û serdemî ye ku li gor bingehên navnetewî û YE'ê hatiye amade kirinê. Bi gor bîr û hizrên me, destûreka bi vî rengî dibête alîkarekê gelek bihêz ji bona çareser kirina pirs û pirsgerêkên Turkiyê yê siyâsî û civakî û çandî. Armanca Projeya guhartina Destûrê jî aliyê AKP ve, destûreka nû nîne, guhartina qismî ye. Lê, me wek PSK, bi destnîşankirina kêmasiyên projeyê û pêşkêşkirina bîr û baweriyên xwe derbareyê destûra nû û serdemî, piştgiriya

Guhertina Destûrê bi gor projeya AKP, ji destûra heyî baştir e û rê li ber demokrasî û guhertinê xweş dike. Ji ber wan û wekî wan sedeman, em piştgiriya Projeya guhartina Destûra AKP'ê dikin

projeya AKP kir. Ji ber ku em baş dizanin ji ber gelek sedemên siyâsî û civakî, AKP vê gavê nikare destûreka nû amade bike, eger bixwaze jî.. Her wusa guhertina Destûrê bi gor projeya AKP, ji destûra heyî baştir e û rê li ber demokrasî û guhertinê xweş dike. Ji ber wan û wekî wan sedeman, em piştgiriya Projeya guhartina Destûra AKP'ê dikin.

Hûn dizanin ku guhertin bi yekcar çê nabin û ya vê carê jî pêdviyên gel nabersivîne. Lê li gorî paketê, guherîna wan madayan ji bo demokrasîyê, mafê mirov, şidandina hewsarê jeneralan û rakirina bandora wan li ser siyasetê û hesab xwastin ji wan pir girîng bû. Ma nedivîya kurdan jî li vê derheqê de destek bidana AK partiye? Yan ger ne wusa ye, gelo AK Partî çî dişopîne?



Bele, rast e. Di zirûfa siyâsî û civakiya Turkiyê ya îro da, hemû cure guhartin carekê da çênabin. Eger Şerê Cihaniya Sisê dest pêneke, an jî di navçeya Rojhilata Navîn da şerê herêmi neqewime, li Turkiyê guhartina siyâsî û civakî wê qonax bi qonax biçîte pêş. Siroştî ye, ku di zirûfa îro de guhertina destûrê jî her bi vî rengî be.

Di projeya guhartina destûrê de hinek xalên gelek girîng hene. Rast e, pêwendiya rasterast di nava xalên hanê û pirsê Kurd de nîne. Lê belê xalên hanê li ber demokratîzekirina Turkiyê xweş dikin, ku di demokrasî û kêşeya Kurd de peywendiyeka gelek kûr û bi hêz hene, ku nayête qetandinê. Bo nimûne, Projeya guhertina Destûrê, desthilatdariya erdeş û dezgeyên qezayî yê bilind kême dike, ku ev herdu dezgeh îro astengên gelek mezin in li pêşya demokrasî û çareserkirina pirsê Kurd. Tiştek siroştî ye, ku her guhertinek di herdu dezgehan de û kême kirina desthilatdariya wan bi qezanca hêzên demokrat, pêşverû, guhartinxwaz, azadî û aştxwaz e; rê li ber damezrandina sîstemeka demokratîk vedibe. Ji bona vê yekê, ne tenê Kurd, divê hemû hêz û gurupên demokrat û aştxwaz piştgiriya guhertina hanê û AKP bikin. Di zirûfa îro da naverok, bername û armanca AKP di guhertina destûrê de çî ye, ne ewqas girîng e. Girîng ev e, kar û kiryarên ku AKP dikin, gavên ku AKP davêje, baş in an na? Opozîsyona serdemî ne ev e, ku hikûmet û partiya desthilatdar çî bêje û bike, em dij derkevin. Piştgiri li kar û kiryar û gavên baş yê hikûmetê, yek ji binemayên muxalefeta serdemî ye.

BDP'ê çima deng bi paketê neda. Ma ew desteknedana bi paketê, wateya ketine hêla CHP û MHP'ê bi awayek otomatîk nagehîne?

Helwesta Partiya Aştî û Demokrasî (BDP) di destpêka proseya guhartina destûrê da baş û guncaw bû. BDP'ê digot, "emê muxalefeta sazgar bikin". Piştgiriya guhertina Destûrê dikirin û bona vê armançê paketek amade kiribûn, ku tede



gelek daxwazên rewa û xalên girîng hebûn. Lê belê, ligel pêşveçûna proseya guhertina destûrê va, BDP jî helwesta xwe hêdî hêdî guhert û di "berêve na" da, ku ji CHP, MHP û hêzên din yê Kemalîst û statûkparêz pêkhatîye, çî girt.

Bi gor bîr û baweriya min du xalên serekî bûne sedema hindê ku BDP helwesta xwe biguhere. Yek ji wan guhnedana AKP bona pêşniyarên BDP bû. AKP bona wê ku nasyonalistên Tirk û balê nijadperest û sovenê navxweyîya xwe aciz neke, ne ligel BDP hevkarî kir û ne jî guhê xwe da pêşniyarên BDP û pêre giftûgo nekir.

Sedema din jî Îmralî, Anko Ocalan bû. Ocalan bi rêka parêzerên xwe ferman da û got, ku "ferq û cudayî di nava AKP û CHP û MHP'ê nîne, AKP jî wan xeternaktir û xiraptir e. Kî çî dibêjin bila bêjin, nabe BDP piştgiriya projeya guhertina destûrê bike" û hwd..

Ligel vê yêkê, him Ocalan him jî PKK digotin, ku "dewlet, (anko ertês, dezgehên qezayî yê bilind, dezgehên muxaberat, karmendên payebilind û Kemalîst) amade ne kêşeya Kurd çareser bikin, lê belê hikûmeta AKP nahêle, asteng e li ber rêka çareseriyê, Ji bona vê yekê jî bi çî qîmetek be, divê hikûmeta AKP bê rûxandinê û hwd.."

Diyar e bîr û boçûna hanê ne rast e, berevajî rastiye siyasîya Tirkîyê û Kurdistana Bakûr e. Rastiyên siyasî nîşana hendê ne, ku ertês, dezgeyên dadwerî û karmendên payebilind her tim asteng bûne li pêşiya demokrasî û guhertinê. Ne tenê AKP, her hikûmetek ku xwastiye bona çareserkirina pîrsa Kurdî gavên piçuk bavêjê, li gel astengên ertês û dezgehên hanê rû bi rû bûne.

Li ser madeya 8 ku girtina Partiyên siyasî zehmet dike, BDP'ê jî deng jêre neda û gelek kes jî, wan tawanbar dikin ku nerasyonel tevgeriyên û dibêjin ew ne bi îradeya xwe ne û bera wan li Birêz Ocalan û Qendîlê ye. Li halek din de jî ger parlemanterên AK partiye, hemûyan deng bidana, dikarin wê madeyê jî ser bixin. Gelo bi raya we eva bi xwe pilana Ak partiye nebû ku kurdan pê tawanbar bike?

Belê, rast e BDP bi xwe jî goriyê vê madeyê ye û bi dengnedana bi vê xalê,

piştgiriya neheqîya derheq xwe û partiyên dinê û herwiha piştgiriya mana siya daxistina partiyan kir.

Lewma wekî her caran, vê carê jî BDP bi helwesta xwe ya hanê nîşan da, ku îrada wê bi temamî di destê wê da nîne, bi gotina Ocalan tevdigere. Ku bi rastî ev yêka ciyê mixabinî ye. Xweziya BDP'ê pitir guhê xwe bidaya hêz û gurûp û kêşên demokrat û welatparêz yê navxweyî û derweyî welat û piştgiriya guhertina destûrê bikiriba. Eger hemû nûnerên AKP deng bidana xala 8 ya Projeya guhertina Destûrê, wê bihata qebûlîrinê. Ne tenê CHP, MHP û BDP, hinek nûnerên AKP jî deng nedan xala 8'ê. Ku bi gor bîr û hizra min, nûnerên hanê beşek bûn ji baskê nasyonalist û nijadperestê nav AKP de. Eger xala 8 bihata qebûlîrinê, daxistina partiyan gelek dijwar dibû. Ku ev yeka jî bi piranî li xizmeta Kurdan de dibû. Nûnerên AKP ku deng nedane xala 8'ê, navxwazin partiyên Kurd hebin, û qanûn hebûna wan desteber bike. Lê belê qanûnên, ku dibine sedama daxistina partiyan Kurdan, her wusa dibine sedema daxistina partiya wek AKP û oliyên dinê. Bi gotineka dinê, nûnerên han yê AKP, bi agirê BDP, partiya xwe jî sewitandin.

Ez bawer nakim ev yeka plana AKP'ê be. Ji ber ku ne tenê AKP, tu partî karê usa nake, ku hebûna xwe bêxe bin xeterê û metirsiyan li ser xwe zêde bike.

Niha kar gihaye ser refrandoma bo Destûrê Gelo helwesta we dê li referandomê de çawa be? Destek yan dijberî? Çima?

Eger zirûfa siyasîya îro berdeyam be, helwesta me di referandumê de dê bi erênî be. Emê dengê xwe bidine guhertinê û ji gelê xwe jî bixwazin deng bidine guhertinê. Lê divê ji bîra me neçe, ku ji bona referandumê hêsta 4 meh heye. Ev der Rojhilata Navîn e û 4 meh jî heyemeka ne kurt e. Di herêmê de istiqrara siyasî nîne û zirûf zû diguhere, bûyerên nepenî zû bi zû diqewimin.

Niha rojeva siyasî ya Tirkîyê û pîlanên ku li dijî kurdan hene, hûn çawa analiz û li çî warekê de dibînin? Herweha li hember de jî erekê Partiyên kurd û bi taybet take partiya beşdar di Parlemantoyê de li hemberî vê rewşê çîye û divêt çawan tevbigerin?

Bi gor bîr û baweriya min, rewşa siyasî ya Tirkîyê aloz e, lê belê aloziya hanê nîşana xêrê ye. Ji ber ku li Tirkîyê proseya guhertina kûr dest pêkiriye. Ku proseya hanê bi tenê girêdayî AKP nîne. AKP carna pêşengîya proseyê dike, carna di nav da çî digre, carna jî dijî proseyê disekine, karên usa dike, ku dibîte astengeka mezin li pêşiya guhertinê de.

Bi gor bîr û hizra min proseya guhertinê wê her berdeyam be. Ji ber ku zirûfên siyasî û civakiya navxweyî û proseyên guhertina deverê û navnetewîyê vê yêkê dixwazin. Tirkîyê mecbûr e xwe biguherîne,

BDP'ê nîşan da ku îrada wê di dest de nîne û bi gotina Ocalan tevdigere. Ev jî cihê mixabinî ye. Xweziya BDP'ê pitir guhê xwe bidaba hêz, gurûp û kêşên demokrat û welatparêz yê navxweyî û derweyî welat û piştgiriya guhertina destûrê bikiriba

eger na dê biguherînin.

Li Tirkîyê ne tenê îro, her tim dijî Kurdan û xebeta azadîxwaziya Kurdan plan hebû, heye. Rêka pûçkirina planên hanê îro jî hevkarîya hêzên Kurdan e, kar û xebata rêxistinî ye, pêgîrbûn e, danana plan û projeyên serdemî û rastbîn e.

Bê guman pûç kirina planên dijî Kurdan, erkê hemû partî û gurûpên welatparêz ên Kurdan e. Guman têde nîne, erkê gelek giran heye li ser milê BDP, ji ber ku di Meclîsa Tirkîyê de çî digre. Lê belê divê ji bîra me neçe, ku pûç kirina planên hanê û serxistina xebata rizgariya Kurdistana Bakûr, barekî gelek giran e û partiyek nikare bi tenê vî barî hilde milê xwe. Ji bona vê yekê jî hevkarîya hemû partiyan, bi taybetî hevkarîya BDP û partiyên din yê legal gelek girîng e.

Hûn li gorî vê rewşa heyî, pêşerojê çawan dibînin?

Bê guman ez wekî kesekî ku bi siyasête ve mijûl im, derbareya pêşerojê geşbîn im. Ez piştrast im gelê Kurd jî wekî hemû gelên bindest wê bigîje azadiya xwe, di Kurdistaneka azad de bi bextewerî bijî.

Di heqê guhertina destûrê jî geşbîn im. Bi gor bîr û hizra min, guhertina destûrê proseyeka dûr û dirêj e. Proseya ku dest pêkiriye, wê berdeyam be. Belê rast e gelek astengên navxweyî û derweyî li ber proseyê hene AKP, ku îro pêşengîya proseya guhertina destûrê dike, di gelek warên siyasî û civakî de dudil e, pêgir nîne. Rast e proseya guhertina destûrî wê carna germ be carna jî sar. Lê belê wê her berdeyam be. Ji ber ku destûra heyî wekî kiraseka teng e di bedena civata Tirkîyê da kurd û pîne kirin jî çare nîne. Çare kiraseke nû ye û bona vê yekê jî proseya guhartina destûrê wê berdeyam be.

Ji ber ku destûra heyî wekî kiraseka teng e di bedena civata Tirkîyê da û pîne kirin jî çare nîne. Çare kiraseke nû ye û bona vê yekê jî proseya guhartina destûrê wê berdeyam be

Sipasnameya Komîsyona Teşkilata Nepenî a PDK Îranê

Civatên xweragire xelkê
Kurdistanê!
Malbatên serbilind ên

şehîdên riya azadiyê!

Endam û alîgirên PDKÎ!

Carek din îrade û hêza polayîn û bawer bi xwebûna şoreşvaniya we wek Quqnûsê li xwelîna karesatek bixwîn serhilda û li wan rojên ku Dêvê tepeserkirin û darvekirinê pirîqe pirîq û qehqeha kenîya serkevtinê bi ser termê pîroze çend têkoşerên riya serfiraziya gelê me de lêdida, sîtavk û tîrojên xwegahî û şaristaniyeta we tevî nerme bayê dilrevîne hevpiştî û yekêtiyê, ewrê pîse dîktatoriyê û tîrsa biyome sîbera reş a wê li ser welatê we ramalî û kopika çiyayê Zagrosê kire tirbûna rengvedana berxwedanekê ku çar ciwanên têkoşer ên gel bi jêhatiyekî kêm wêne, şabeyta wan, bi xwîna paka xwe li ser rûpelên dîrokê nivîsandin û yek bi yeke we, pîr û ciwan, jin û mêr, xwendekar û mamosta, bazarî û kedkar û hemû tex û qatên civaka Kurdistanê bûn bi pît, peyv, dêr û hevok bo serxistin û tomarkirina vê berxwedanê.

Dema ku celadên Êvînê, çar şêrên birîndarên zincîr û qeydan di roja 9'ê Gulana 2010'an de, ber bi gorîgeh û kindira darvekirinê dibirin, wan pêwe bû ku bi vê tawana bi tirs û xof, dê henîs kû nefesê di qirika Dalaho de de bixendiqînin û zincîrê di

stûye Awyer û Şîrîn Siwar û Bêstûnê de bikin û Agiriyê bo hertim biçok de bînin û hêz û baweriyê qahîm û polayîn a demokrasî xwaziyê dihiloşînin. Lê wek dîroka berxwedana gelê me selmandiye, li wê dema ku em hene û Kurdistan Kurdistan e, rê û rêbaza serfirazî û rizgariyê, çem û rûbarek herki ye ku bûye çavkaniya ronahî, jiyane û astengan ji nek tu car nekarîne bisekinînin, belkî her kosp û astengek, bûye sedema pengorîna kerb û qahîmbûn îradeya me bo hiloşandina kela tarîti û zulm û zorê, herwiha me xurtir ji caran riya serkevtin bo gihîştin bi armancên xwe pîvaye.

Endam û alîgirên PDKÎ!

Bo hemû kesê eşkere ye ku bi rêveçûna berfireh a girevgirtina seranserî di roja 13'ê Gulanê, destkevtêki netewî bû ku rola sereke ya we di berhevkirina vê girevgirtinê de û kar û xebat û çalakiyên we di riya belavkirina tirakt û dirûşmên şoreşvanî û bangewaza partiye û handana xelkê Kurdistanê bo xweragiri li hember desthilata Komara Îslamî de, rojek zêrîn û jibîrnekirî bo hertim di dîroka xebata rizgarîxwaza gelên Îranê de dijî vê rejîma kevneperest tomar kir û perperoka ruha pîroze şehîdan kire mêvanê baxçe û gulistana evîniya we û dilê xembar û şewitiye dayîkên tazîbar ji emegnasî û pêzanîna we li hember bargeha pîroze



şehîdan xatircem kir.

Komîsyona Rêxistinî a PDKÎ bi erkê ser milê xwe dizane ku hewl û xîreta jêhatî û biwêraneya we di pêxema serbilindiya partiye û gelê me û rola înkâr nekiriya we li birêvebirina serkevtiyane û berfirehkirina girevgirtina seranserî ya roja 13'ê Gulanê ligel hemû gef û givaşên rejîmê û nehezên gelê me, rêz jê bihê girtin û spasên bêdawî yên xwe pêşkêşî hemû aliyekê bike û destê mandînenasiya we bi germî bigivişînt. Bêguman ev serkevtine, berhema kar û tekoşîna şoreşvaniya we ye û di pêşerojê de jî, rênivîniyek e bo berfirehkirina xebat di pêxema azadî, demokrasî û serkevtina her çiqas zêdeye me di rêvebirina erkê partî û netewa me de.

Komîsyona Rêxistina PDKÎ
16'ê Gulana 2010'ê Zayînî
26'ê Banemera 1389 ê Rojî

Bila qirkirina Kurdan Li Kurdistana Îranê raweste!!

Rêberê Silivî

Berbanga roja Yekşemî
09.05.2010'an, karbidestên
devbixwîn ên dewleta Îranê, 5

ciwan ku çar ji wan Kurd bûn, li girtîgeha Êvîn a Tehranê bidarve kirin. Ew jî ev bûn: **Ferzad kemangar, Elî Heyderiyar, Ferhad Wekilî, Şîrîn Elam Holî, Mehdî Îslamiyan.** Herweha, wekî tê bîra me hemiyan, dîsa wan berî çend mehan çalakvanekî Kurd ê bi navê **Ihsan Fetahiyan** darda kirin.

Her kes dizane ku ji bilî Kurdbûna wan pêve, tu sûç û gunehên wan ciwanan tiştek tune ye. Tenê ew Kurd in, ew ji hemî maf û azadiyên xwe yên netewî û mirovane bêpar in, daxwaza aşti û wekhevîyê dikin, daxwaza rûmeta xwe ya netewî dikin. Ma gelo ev gunehkarî ye û cezayê wê kuştin e?!

Tiştê ku dilê mirov kul û birîn dike ewe, ev tawana mezin li ber çavên raya giştîya cîhanê û bêdengîya dewletên demokrat tene kirin, herweku

kuştin û bi darvekirina Kurdan di vê cîhana me ya nûjen de tiştêki xwezayî û normal e!!

Tiştê ku mirov matmayî dihêle ewe çawa ev qirkirin û kuştina Kurdan bi bêdengî derbas dibe?! Çawa miletek bi kêra berpîrsên zikreş ên Îranê tê serjêkirin û rêxistinên navnetewî bi erzanî li xwîna wan ya herikî temaşe dikin û dengên xwe hemberî van tawan û komkujiyan bilind nakin!! Ma gelo belge û prensîpên rêxistina netewên yekbûyî li kûderê mane? Ma gelo parêzerên mafên gel û mirovan li kûderê ne, çima ew dengê xwe nakin?!!

Karbidestên Komara Îslamiya Îranê qûça civaka navnetewî hildane, li serê xwe siwar bûne, nema giraniyê didine hilwestên civaka navnetewî û ew li ser rêya bidestxistina çekên Etomî berdewam in Ango mirov dikare bibêje mîna gurên har ên dev bixwîn li wan hatiye, ketine nava gelên Îranê bi tevayî û gelê me yê Kurd bi taybetî û bi hovîti xwîna wî dirjînin!!

Roja pêncşembê 13.05.2010an, li ser daxwaza Paritya Demokrata Kurdistan a Îranê û hêz û pariyên dîtir li Kurdistanê gireva giştî bû, ji hemî hêz, sazî û rêxistinên mafên mirov li seranerî cîhanê hat xwestin ku ew piştigiriya gelê Kurdistanê bikin û wî ji qirkirinê biparêzin, rijêma rû reşa Îranê serşor û riswa bikin û vî gelê bê sûc û bê guneh ji mirinê rizgar bikin!!



Pêşmergeyê Kevnar ê PDKÎ Çû Ser Dilovaniya Xwe



Roja 15'ê Gulana 2010'an, Pêşmergeyê kevnar ê PDKÎ, bi navê Kazim Ezîzî, bi sedema rawestana dil çû ser dilovaniya xwe û tevî karwanê şehîdan bû.

Kazim Ezîzî di sala 1962'an de, di malbatek welatparêz a gundê Sultanî, ser bi devera Somaya bajarê Urmiyê hatibû dinê. Navhatî her di destpêka temenê ciwaniya xwe de ji ber hestkirina bi zext û givaşên dujmin li ser netewa xwe, di sala 1982'an, peywendî bi refên Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê girt û xebata xwe dest pêkir. Piştê di sala 1983'an de, biryar da ku kincên pîrozyên pêşmerge li xwe bike.

Kazim di heyamê temenê pêşmergeyatiya xwe çend car birîndar bûye, navhatî cara dawîn di sala 1993'an di girtina binkeya leşkeriya Nêçelana devera Biradost de bi sedema giraniya birîna xwe nekarî dirêjî bi çalakiyên xwe di deverê de bide û piştê li gor şiyar û jêhatiya wî, di organa xedematê de heta dawiya jiyana xwe dirêjî bi xizmetkirin bi partî û nîştimana xwe de. Kazim Ezîzî, mirovekî bi dîsîplîn, ruh siwîk û dilsoz bû. Her li wê rojê de termê pîroze şehîd Kazim Ezîzî bi beşdariya hejmarek berbiçav ji endamên Deftera Siyasî, Komîteya Navendî û kadr û pêşmergeyên PDKÎ di goristana şehîdên Cejnîkanê de hat veşartin. Di dawiya rê û resma veşartinê de, kuşeyek ji jiyar û xebata vî şehîdî, ji aliyê Sidîq Derwîşî, endamê Komîteya Navendiya PDKÎ û berpîrsê Navenda Sê ya Kurdistanê ve hat pêşkêşkirin.

PDKÎ behî û serxweşiya xwe pêşkêşî malbat û kes û karên şehîd Kazim Ezîzî dike û sebrê ji wan re dixwaze.

Ruha wî şad û riya gihîştin bi armancên wî jî, pîr rêvîng be.

Diya Şehîdekî Riya Rizgariya Kurdistanê Çû ser Dilovaniya Xwe

Sidîqê Îbrahîmî, diya şehîd Kamil Îbrahîmî, di temenê 80 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand: kurek din yê Sidîqê binavê Eladîn Îbrahîmî, berê ji aliyê hêzên rejîmê ve, tenê ji ber wê yekê ku birayê şehîdê Partiyê ye, kete ber destrêjî û jiyana xwe ji dest da.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, bi hinceta koça dawî ya Sidîqê Îbrahîmî, serxweşiyê ji malbat û kes û karên navhatî dike. Ruha wê şad û cihê wî jî buheşt be.

Rojev

Lihevkirina Navikî Yan "Hequl Sikût" Li Hember Serkutên Navxweyî



Selîm Zencîrî

Li halekê de ku superhêzên cihanî û bi taybetî Amerîkayê, lezatiyek taybet dabûne xebat û hewlidanên xwe ji bo xurtkirina ambargo û

dorpêçên giran bi ser Îranê li Civata Ewlekar ya NY de û meydan li Îranê teng kiribûn, lê me dît ku rêberên Îran, Turkiya û Brazîlê roja Duşemî 17'ê Gulanê, lihevkinê 10 xalî li dor guhertina Uraniyomê li Turkiyê de wajo kirin. Eve jî li halekê de ye ku çendîn sal e maşkanê û lîstika Mişk û Pişîka Komara Îslamî bi welatên superhêz re berdeyam e û çendîn biryarnamê dorpêç jî li dijî Komara Îslamî li pey re hatine, lê tu yek ji wan nebûye sedem ku rejîm dev ji mehandina Uraniyomê û bernamêya bişik û guman ya xwe berde û nîgeraniyên navnetwî jî li vê derheqê de verevîne.

Komara Îslamî piştî çend sal xapandina rojava û bi taybet her sê welatên ewropî, karî demek zaf qazanc bike û bêtirs armanca xwe bişopîne ku pêşketinên berbiçav jî bidest xistine. Lê piştî têgihîştina Ewropiyan ji niyet û armanca xirab û metirsîdar ya rejîmê û ketine xeterî ya berjewendiyên wan, niha li dijî pirogramên rejîmê derketine û dixwazin pêşiya Îranê bigrin. Lê vê gavê lihevhatina li Tehranê, ew hêvî û xebatên bo tehrîmên girantir û berfirehtir, kêmrang kiriye. Çunku Komara Îslamî bi vê lîstikê û senaryoyê xwast xwe ji barê giran yê dorpêçên navnetwî rizgar bike û bi bêhnek firehtir û demek dirêjtir bernamêya navikî a xwe bidomîne û ji meqsedê nêzik bibe.

Lê bi raya çavdêrên siyasî, ew lihevhatin li cihê xwe de serbarê hin qazancan, şikest û paşdekişyana Komara Îslamî jî digehîne. Çunku Îranê berê sê merc bo lihevhatin li dor pîrsa navikî a xwe bi ewropiyan re danibû. Weke: Guherîna hevdem a Uraniyoma %3/5 bi %20'ê, guhertin li xaka Îranê de û ya din jî diyarîkirina qasê Uraniyoma guherkî li ser bingeha hewcehiya Îranê. Lê li vê lihevkinê de bi nabeynkariya Turkiya û Brazîlê, bêy berçavgirtina tu yek ji wan şertan, amade bû ku 1200 kg Uraniyoma %3/5, li gel 120 kg Uraniyoma %20 piştî salekê li xaka Turkiyê de werbigre. Ku eva jî ne tenê xwastên Îranê bi cî neanî, belkî paşekişiyek tam bo rejîmê jî digehîne.

Li ser vê bingehê, li cihê de ye ku ev pîsare jî karbidestên payebilind yên Îranê bihê kirin ku li gor çî eql û lojîkekê derfetên baştir yên berê li ser bernamêyên pîr zîraa a navikî jidest dan û bac û têçûyek zaftir bi ser gelên Îranê de sepanîndin? Gelo ma wan nedikarî her wê



demê lihev bên heya ku negihîje vê qonaxê? Ma nedikarî li cihê bacdan û puandan bi Turkiya û Brazîlê, rasterast bi welatên biryarder re lihev bên heya ku zirarek kêmtir bigihîje xelkê Îranê?

Lê li bakgirawend û piştperdeya vê helwesta celadên Îranê, çend tişt xwe didin eyanê ku bi kurtî ezê îşare bi wan bikim.

- Li demên dawîn yên sepanînda cezayan ji aliyê civaka navnetewî bi ser Îranê de, rejîmê bi vê senaryoyê dîsan dest bi lîstika xwe kir û xwast wan bi nîsbet çareseriyê pîrsa navikî ji riya diyalog û guftigoyê ve hêvîdar bike û bi şeq kirin û têkdana refa yekgirtî a navnetewî xwe ji sepanînda tehrîman rizgar bike.

- Xwast ji givaşên navnetewî li ser xwe derheq pêlên tepeserî û îdamên vê dawiyê kêmtir bike.

- Ji bo kundirola navxweyî û tepeser kirina gelên Îranê li serûbendê kûdetaya hîlbijartinê de, berevajî durûşmên xwe li dijî rojava, bo midehek demkî ew pejirand. Bi wateyê din ew, bacdan, bertîl û "Hequl Sikût" ek bû bi rojava li hember serkutên navxweyî.

Hemû evana li halekê de ne ku civaka cihanî serbarê pêşwazîkirin ji guftigoyê, lê ragihandin ku şik û guman hêj mane û ew lihevkirina biguman nabe sedem bo pêşgirtina sepanînda cezayên nû bi ser Îranê de, lewre pêşnivîsa biryarnamêyê jî hatiye pejrandin û egera wê heye ku li demek nêzik de gera nû ya tehrîmên giran bi ser Îranê de bihê sepanîndin. Çunku edî cihan ji fend û fêl û lîstikên Komara Îslamî tê gihîştîye û bi wan senaryoyan nahê xapandin. Eva ku derhal Îranê piştî lihevkinê ragihand ku serbarê vê rêketinê emê li hundirê welat de jî mehandina Uraniyomê bidomînin, eyankerê vê rastiyê ye û niyeta rastîn a Komara Îslamî jî êşkere dike ku xincî xapandin, hederdana demê bo bidestxistina çeka atomî, tepeseriyên navxweyî û kêmkirina givaşên navnetewî li ser xwe, ne tiştê din e.

Jiyana Di Kûrexaneyan De



Ceifer Mubeshirniya

Jiber zulm, zorî û cinayetên ku gihîştine kopika xwe di siyasatên qirêj ên Komara Îslamî a Îranê bi taybetî di warê mafê

mirov de derheq gelên mafxwarî yên Îranê de, zaf ji pirsgirêk û aloziyên din yên civakê nayên berçav, yan kêmrang û wunda ne yan jî li baldanê dikewin.

Lewma hewce ye em wan pirsên wunda bixînin rojevê. Yek ji wan pirsan, jiyana di kûrexaneyan de ye. Jiyana ku pêtir dişibe jiyana kole û berdeyan, jiyana ku ji ber hejarî û bêkariya berfireh di Îranê de ji ber siyasatên dijîgelî yên rejîma Komara Îslamî bi ser gelê kurd de hatiye sepandin. Jiyana ku li wan Kûrexaneyan de malbatên kurd û bi taybetî keç û jin û zarok serbarê bêmafîyan, êş û azar û kovanên pir dikşînin. Wan jiyaneke ewqas xerab heye ku bi tu awayekê nabe mirov navê jînê lê bike. Çunku çend malbat neçar in bihevê de jorên 12-13 metrî de bi yek avdest û serşokek hevbeş, serbarê ew hemû bê îmkaniyan bijîn. Ji aliyê dinê jî nebûna îmkaniyên pêwîst ên karkirinê û herweha yên dermanî û saxlemiyê li dema nesaxî yan jî bûyerên di dema karkirinê de, ji mezintirîn pirsgirêkên wan in.

Seba wê ku ew malbat ji ber bêkariyê û



bi neçarî rû ji Kûrexaneyan di bajarên dûr ên Îranê de dikin, naçar bi cihanîna her emrek nerewa ji aliyê xwedî karan dibin. Piraniya caran riftarên nebaş li gel wan tê kirin, gelek caran jî tûşî destdirêjiyan dibin, li dana heqdest de jî fêl û zulm ji wan tê kirin, tèn xapandin û bi taybetî nedana pereyê "bîmeyê" ji aliyê xwedîkaran ve ku dibe givaşek din li ser jiyana kedkaran. Her wek tê zanîn karê kedkarên kûrexanan werzî ye, anku tenê du demsalan (6 mehan) kar dikin, lê tê gotin piraniya

caran xwedîkar di 6 mehên karkirinê de, tenê heqdestê 3 mehan didin wan û 3 mehên din jî bi dezgehên peywendîdar radigehînin ku kar nayê kirin, yan jî ji bo "Bîmeyê" hatiye terxan kirin. Ewa jî wê zulma organ û sistema gendel û heramxwar a hikûmeta Îranê eşkere dike ku li dozên wiha û li dema nerazîbûna karkeran de pişt xwedîkaran digrin û ji bo xwarina pereyê ku bi ked û areqeya zarok, nûciwan, keç û pîr û kalên kurd ve di karek wiha pîs û giran de tê bidestxistin.

Karê zehmet û pir îza û dijwar yê kûrexanan bi taybet ji bo jinan û zarokên ku piraniya wan di temenê 10 heya 17 saliyê de ne, dibe sedema nesaxiyên cur bi cur. Wek tê zanîn piraniya wan jin û nûciwanan tûşî nesaxiyên eşên masûlke, feqerat û îfûnetê dibin.

Di heman demê de ew malbat xwedî zarokên biçûk û sêwî ne û rojane di encama pêre negihîştin, nebûna îmkaniyên hewcehiyên zarokan bo mijûlbûn û biser birina dem xwe, neçar in di nav kirs û kewal û avên pîs yên kargehan de bigerin û di encam de tûşî çendînan nesaxiyên dibin, bêyî wê yekê ku kêmtirîn pêregehîştin û îmkaniyên dermanî û saxlemiyê hebin yan jî ji rênimayî bo xwe parastin ji nexweşiyên bi mifah bin. Lê ya ji hemûyan girîngtir û derhêq bi zarokan xerab û pir zirartir, ewe



ku ew zarok ji xwendin û perwerdeyê bêpar in û çavniherî dikin heya ku hinek mezin bibin û di kûrexaneyan hevkarîya malbatên xwe bikin ku weke take pişe di ber destê xwe de dibînin û di buhara temenê xwe de wiha diçirmissin û di tarîtiyê de dijîn. Wan heta şiyana nasîn û destnîşankirina mafên xwe jî ninin, çî bigîje daxwazkirina wan mafan.

Di yare di sistema hikûmeta Îranê de li rûyekî de bi nav Wezaretek bi navê "Rifah û Temîn Ictimaî" anku tenahî û dabînkirina civakî heye, lê ew jî mîna her wezaret û organek din yên hikûmetî, tenê bi nav û bi awayek maşkanê û ji bo kes û karên xwe kar dikin. Li rastî de hemû ew mafên ku berheq û rewayê her kes û bi taybet kedkaran in û li yasayên navnetewî yên pêwendîdar bi mafê mirov û yasayên kedkarî de jî îşare bi wan hatiye kirin, li pileya yekem de sistema siyasî a Îranê wan bînpê dike û yên li qonaxa din de jî, organên gendel û tepeserkar yên hikûmetî yên peywendîdar, di encama lênepirsîn û li berçavnegirtina tu yasayek mirovî ji wan distînin û rewşek wiha pêk anîne ku bi eşkere ew malbat ku beşek ji civakê pêk tînin, ji serdema niha dûr ketine. Bi watayek din mirov dikare bibêje ku ew bi neçarî di cehaletê de dijîn.

Li Îlamê 514 Malbatên ku 2-3 Zarokên Wan Kêmendamin, Hene

Hat zanîn ku li Parêzgeha Îlam ya Rojhilatê Kurdistanê, 514 malbatên ku zêdeyî zarokek wan kêmendamin e, hene û piraniya wan nikarin bilivin û bimeşin û di warê cestayî de rewşa wan pir xirab e. Serokê Giştî yê Îdara "Behzîstî" ya Parêzgeha Kirmaşanê Sadiq Rostemî, di daxuyaniyekê de ragehand: "514 malbat li Îlamê zêdeyî zarokeke wan kêmendamin e ku ji wê hejmarê 425 malbat xwedî du



zarokên kêmendamin in, 58 malbat jî zêdeyî 3 zarokên wan ên kêmendamin hene û 28 malbat jî xwedî çar zarokên kêmendamin û 2 malbat jî 5 û 6 zarokên wan ên seqet û kêmendamin hene". Îlam yek ji wan Parêzgehên Îran û Rojhilatê Kurdistanê ye ku herî zêde mayînen ne teqiyayî tede hene û salane jiyana sedan kesan li wê Parêzgehê distîne yan bi dijwarî birîndar dibin û wek kêmendamin jiyana xwe didomînin.

Herçiqas ew îstatîstîka ku ji aliyê berpirsekî Komara Îslamî li Îlamê derbarê radeya kêmendaminê hatiye eşkere kirin, lê pisporekî warê civakî li Îranê didin zanîn, serjimêriya han ne rast e û jimara wan malbatan ku xwedî yek yan çend kêmendamin in, gelek zêdetir e û dewlet bi kêmi piştigiriya wan kêmendamin dike.

Kesayetiyeke Naskirî Ê Devera Bakûrê Kurdistanê Îranê Çû Ser Dilovaniya Xwe

Roja 15'ê Gulana 2010'an, Şewqî Emîr Fenekî, kurê Ebas Axayê kurê Temer axa, kesayetiyeke naskirî yê devera Soma Biradost û serok eşîretê "Fenek" di temenê 85 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand, navhatî li gundê Qunî a ser bi devera Soma Birados a bajarê Urmîyê, di



malbatekî welatparêz û dilsoj hatiye dinê, Temer axa bapirê wî, çend caran li gel malbata navhatî tevî û rûsan şer kiriye û Ebas axayê babê vî jî di serdemê Komara Kurdistanê de yekek ji piştgirên sereke yên Komara Kurdistanê dibe û tevî Eşîreta xwe û xelkê din bo piştgirîkirin ji Komarê han didan.

Şewqî Emîr Fenekî, kesayetiyeke xweştevî û naskirî yê devera xwe bû û pêgehekî bihêz a civakî hebû ku di piraniya karûbarên deverê de pirs pê re dihat kirin.

Bi vê hilkevê PDKî behî û serxweşiya xwe pêşkêşî malbat û hemû xelkê deverê dike û xwe şîrikê xema wan dizane.

Felsefeya Şahî Û Dawetên Kurdî li Bakurê Kurdistana Îranê

Beşa 1



Mecîd Cinîkanlo

Her wek em dizanin Neteweya Kurd li dirêjîya dîroka teji ji xwîn û berxwedana xwe bi awayên cur bi cur ji mafên xwe yên mirovî û hebûna xwe wek

neteweyek zindî berevanî kiriye û di vê riyê de bi sedan destanrêsiyên mezin afirandine. Yek ji sembol û nîşanên hebûna Neteweya Kurd govend û dîlanên Kurdî ne, ku li herêmên curbicur ên Kurdistanê de, ev dawet û şahiyane wek sembola berxwedaniya neteweya me tê mêzekirin û bi giştî felsefeya wan şahî û govendên Kurdî, nîşaneyê bûyer û serpêhatiya gelê Kurd e, ku bi salan bi xebat û têkoşîna azadîxwaziya xwe, li mafên xwe yên çandî û mirovî berevanî kiriye.

Şahî û dawetên Kurdî wek pareke mezin li Kultora neteweya Kurd tê mêzekirin. Dawetên Kurdî yek ji nîşanên hebûna neteweya me ye û parek mezin ji dîroka neteweya me bi awayekî baş parastine. Dawetên kurdî ku bi ser çend çiqên serekî de tîr parvekirin, her yek ji wan nîşanek ji hebûna neteweya Kurd e ku ji bo parastina çanda xwe bi salan xebatê dikin. Şahî û govendên Kurdî seba berfirehbûna xaka Kurdistanê bi ser çend curan tîr parvekirin, lê di rastî da felsefe û armanca govendên Kurdî yek e, û ev jî eyankerê rewşa gelê Kurd li dirêjahîya dîrokê de ye. Govendên kurdî ku îro rojê em wan dibînin, di rastî da tenê reqsekî sade nine û van govendan her yekê dîroka taybet bi xwe hene û tiştek zêdetir ji govendeke sade ye. Zor kes li ser vê baweriyê ne ku dîlanên Kurdî li baweriyên kevnar yên Kurdan hatine wergirtin û li rastî de ev govendane bi olê Zerdest re girê didin. Pêka wan çavkaniyan, berî êrîşa Îslamê zêdetir ev dawetên han li ber Perestîşgeha Anahîta û ji bo şukra Xwedê û gotina serpêhatiyên şerên xwe, mifah ji davetan wergirtine.

Dawet û dîlanên Kurdî wek stran û awazên Kurdî li çar curên bingeîn pêk tîr, wek: Dawetên îrfanî û olî, xweşî û nexwaşî, ku li piraniya wan dawetan de bi herikîna endamên wan dîlanan, dawet wateyeke taybetî dide.

Emê li gotara han de cehdê bikin ku parek kêm li govendên Herêma Bakûrê Kurdistana Îranê bo Xwendevanên Agirîyê bidin şirove kirin.

Dawetên Bakûrê Kurdistana Îranê li 3'ê corên sereke pêktîr.

Şêxanî

Milanê

Kitane yan Qutane

Her yek ji dawetên îşarepêkirî bixwe xwediyê çendîr curên dawetan e, û çendîr



çiq ji wan cuda dibin.

Dîlanên vê Herêmê bi awayek nerm destpê dikin û nezm û parastina yekîtiya dawetê ji eslên herî serekî yên wan dîlanan e. Ev dîlan bi awayê bikom destpê dike û li destê neferê yekem ku bi Serçopî tê naskirin û destmalek li dest de ye ku ev destmal cihê helbest û Mertalan girtiye ku îro rojê li ber pêşketinên cihanê Kes mifahê ji helbest û mertalan wernagire. Lê ev destmala sipî bi nîşaneyê aşîxwaziye tê şirovekirin. Li wan dawetan de Jin û mîr bi hevra û mil bi milê hev dawetê dikin û ev yek bi nîşaneyê wekhevbûna jin û mîran di civakê de ye, ku ev yeke li çend hizar sal berê heyani îro rojê hatiye.

Kutana pêyan li ser erdê bi wateya vê yekê ye ku ev xake ya min û bav û kalê min e. Herwisa qîjandina bihevre ji bo xistina tirs û xofê li nav dilê dujimin de ye. Rûniştin li çaxê dawetê de bi wateya rêzgirtin ji ked û zehmeta hevalên wî tê hesabandin.

Dîlanên Kurdî wek reqsekî rezmî jî tê mêzekirin ku xwediyê giranî û mîraniya Kurdan e, û herwiha bîranîna yekbûna neteweya Kurd e.

Hin ji wan govend û dîlanan li rastî de bîranînen dîrokî yên neteweya Kurd in. Bo mînak daweta Kitane yan Qutane ku bi wateya lîxistinê ye, dîlanek e ku dîroka wê bo berî 500 salan vedigere û bîranîna berxwedaniya parek li şorişgerên Kurd li herêma Urmiyê li hemberî Sipaha Şa Ebasê Sefewî ye. Ev dîlan, îşare bi berxwedana Xanê Lepzêrîn li hemberî dagîrkerên xaka Kurdistanê li Kela Dimdim e. Ev dawet li seraserê Kurdistanê heye û li rastî da, bas ji belengazî û berxwedaniya Kurdan li hemberî dijminan de dike. Serpêhatiya wê bûyera han ji aliyê Erebe Şemo, nivîskarê Kurdî Rûsiyê hatiye nivîsandin.

Bi awayekî giştî dîlanên herêma Bakûrê Kurdistana Îranê, piraniya wan bas li berxwedanî û cangorîtiya neteweya me dikin û hest û sozên Kurdan li hemberî bûyerên Kurdistanê heya îro rojê didin xuyanîkirin. Bo mînak ji dawetên wê herêmê, Dîlana Eraban e, ku ev dîlan jî her basê berxwedaniya kurdan li hemberî êrîşa Eraban bo ser xaka kurdîtanê dike.

Hey Eraban, can Erebe min, Eraban qir kirin, can levendê min

Kaniya Helbestan

Li oxira baranê



Beşîrê Mele

Li Zagrosan hûn teyrikên bê

bask bûn

Çem çiyar digeriyan

Şemalî baxî Rojhilat bûn

Barana we ji keldûmana

Dicle Ferat,

Du Zab Arasin...

Sêdarvanê komara Leglegan

Hûtê sirgoyan

Çekçekolên petrolan

Destên wan li we geryan

ji fira we tirsyan!

mîna hîmê volkanî hildikişin

ser sêdarê

di kulma we de firîkên

genim,

şolik û nîskê vê buharê

we li ber bayêreş

ji mejyê birçî re dêrand

û min ji ber we ve

sê tif dane riwê celadan



Terorîstê Komara Îslamî Li Firansa Serbest Hat Berdan

Du rojan piştî serbestberdana Klotîd Rîs, şaromenda Firansiyayî ku heyamê 10 mehan di girtîgehên rejîma melayan de bû, dadgeha birêvebirina hukman li Parîsê, roja Sê şemî hukmê derkirina Elî Wekîlî Rad, terorîstê şandî yê rejîma Îranê derkir ku di terora Şapûr Bextiyar, dawîn Serokwezîrê hikûmeta Şah de dest hebû Terorîstê han midehê 19 salan di girtîgeha Firansayê de bû. Wisan dixuye ku wan guhertina girtiyar kiribe.



Lê dewletên Firansa û Îranê, ew yek red kirin. Lê Ehmedînejad di meha

Siptambera derbazbûyî de gotibû ger ku Firansa, xwazyarê serbestberdana Klotîd Rîse, gerek mesela guherîna girtiyar binirxîne.

Ligor yasaya Firansayê, girtiyên biyanî ên mehkûm bi girtîgeha hetahetayî, piştî 18 sal kişandina cezayê xwe, bo welatê xwe tîn vegerandin ku cezaya mayî di welatê xwe de bikşînin.

Hêjayî gotinê ye ku Elî Wekîlî Rad, roja Sêşemî bi awayek fermî li Tehranê de ji aliya karbidestên payebilind yê rejîmê ve hat pêşwazî kirin.

Nato: Rejîma Îranê Gefek Mîcid E Li Ser Welatên Endam

Rapora nû ya 55 rûpelî a karnasên Natoyê ku roja 17'ê Gulanê hat weşandin, bas ji gef û metirsiyên bernamaya navîkî û mûşekî ya Îranê li ser xwe Nato'yê dike..



Di wê raporê de, şyanên mûşekî û balistikî yê Îranê li rex bernamaya navîkî a wî

welatî, weke gefek mîcid bo ser hemû endamên Natoyê dizane. Lewma li vê derheqê de nigeraniya xwe derbiriye û daye zanîn ku: "Berevanî kirin li hember egera êrîşa mûşekî ya Îranê li dijî welatên endam di vê peymanê de, divêt weke memûriyetek nû a vê rêxistinê cihê baldanê be. Li gorî xala 5 a vê peymanê, divêt berevaniya tevalî li hember gefên mûşekî yê Îranê li dijî her yek ji endaman be. Her li gorî wê xalê, êrîş bo ser her endamekê, tê wateya êrîş bo ser hemû endaman û divêt hemû welatên endam li hember hêza êrîşber de reftendiyê bikin.

Li gorî wê raporê, sê mijarên Îran, Elqaîde û aştiya Erebi-Îsrail weke sê gefên mezin bo ser Peymana Natoyê tîn hesabandin û xwazyarê hevkarîyên zêdetir ên endaman bi welatên Rojhilata Navîn û Bakûrî Afrîqayê ye. Herweha di wê raporê de hatiye ku xurtbûna karîn û şyanên mûşekî sahil bi behrê ên Îranê di devera kendawa Fars û Behra Emarî, wek gefek mîcid bo ewlehiya liv, hat û çûna gemiyên niftê di wê deverê de hatiye zanîn.

Zêbarî:

Tirkiye û Îran Nahêlin Hikûmet Ava Bibe

Wezîrê Derve yê Îraqê Hoşayyar Zêbarî, di derheqê avakirina hikûmeta Baxdayê da daxuyaniyek da û got "sedemê ku hikûmeta Baxdayê ava nabe, desttêwerdan û midaxeleya welatên cîran yê Îran û Tirkiyê ye". Zêbarî wisa got "Sûriye, Îran û Tirkiye ji bo ku hikûmet ava nebe, her yek bi awayekî desttêwerdanê dike. Li welatên



cîran fikar heye ku ê Îraq îstîqrarê bi dest nexe. Ji bo pêşeroja Îraqê rikeberiyek mezin di navbera welatên cîran de heye û ev reqabet jî pirtir di navbera Îran û Tirkiyê de ye. Her du welat jî bawer in ku berjewendiyên wan li Îraqê hene."

Zêbarî got "Di hilbijartinan de, Eyad Ellawî bi ferqeke biçûk namzedê şeyan Malikî li paş xwe hişt. Ji ber ku Malikî nêzî Îranê ye, DYA wî nawxaze. DYA û Tirkiye li hemberî Malikî, piştgirî didin Ellawî."

Ji aliya din vê tê ragihandin ku DYA ê vekîsandina leşkerên xwe ji Îraqê, ji ber sedemên neavabûna hikûmetê, mehekê dernege bixe.

Kuşnêr, Behmen Qubadî Bi Derhênerekî Bişiyar Binav Kir

Wezîrê Karê Derve yê Fransayê Bernard Kouchner, piştî ku li filma sînemayî a derhênerekî kurd Behmenê Qubadî, ya bi navê "Pişikên Îranî" kir...



Qubadî bi derhênerekî bişiyar, modern û mandînenas wesif kir. Li ser daweta Kouchner, filmê

Pişikên Îranî yê derhênerekî kurd Behmen Qubadî bi amadebûna 500 rayedarên warê ferhengî, siyasî û dezgehên ragihandinê yê Fransayê, tevî şewirmendê Kouchner li hola sînemayê a Wezareta Derve yê Fransayê hate nûmandin.

Bernard Kouchner di axaftinekê de kêfxweşiya bi vexwandina filmê Pişikên Îranî nişan da û rolê Behmen Qubadî jî bilind nixand û pesinda şiyar û jêhatiya wî kir.

